'Zarokê Min' di 7'ê hezîranê de dikeve vîzyonê

Belgefîlma metrajdirêj a bi navê 'Zarokê Min' a ku derhêneriya wê Can Candan kiriye dê 7'ê hezîranê de têkeve vîzyonê. Her wiha fîlm dema ku li Stenbolê galaya wê hat kirin ji aliyê temaşevanan re rastî eleqeyeke mezin hatibû.

Di fîlmê de qala tecrûbeyên heft dayik û bav ên ku di nava jiyana civaka homofobîk, transfobîk de rola malbatê û di aliyekî din de jî rola aktivîstiyê tê çi maneyê dike radixe ber çavan. Wekî tê zanîn belgefîlma 'Zarokê Min' a ku Can Candan derhêneriya wî kiriye, di Mîhrîcana FîlmAmedê hatibû nîşandan û layiqê Xelata Juriyê ya Taybet hatibû dîtin. Heta niha belgefîlm li gelek zanîngeh, mîhrîcanan de hatibû nîşandan û hejmara temaşekirina wî gihîştibû 7 hezar 500'an.

BERNAMEYA PÊŞANDANÊ

Her wiha belgefîlma 'Zarokê Min' di meha hezîran û tebaxê de dê li gelek mîhrîcanan de cihê xwe bigire. Di 11'ê hezîranê de dê li Mîhrîcana Fîlmên Navneteweyî ya 6'emîn a Kerala de cihê xwe bigire, di 21'ê hezîranê de di Mîhrîcana Belgefîlman ya'Open City Docs Fest', di navbera 21-30 hezîranê de li Romayê di Mîhrîcana FîlmMed ya 19'emîn, di 11-13 tîrmehê de li Mîhrîcana Navneteweyî ya Chennai, di 22 hezîran-2 tîrmehê de di Mîhrîcana Cîhanê ya Montrealê de cihê xwe bigire. ***AMED***